



# Bernameya avahî û saziyê

KURMANJI

**Bernameya avahî û saziyê  
bernameyeka pişeyî ye û  
bidestxistina dîplomeya  
pişeyî armanca wê ye.**

Bernameya avahî û saziyê ji te re ye ku hez dike di warê avakirin, sexbêrkirin û jinûveavakirina xanî û saziyan de kar bike.

Tu dikarî piştî qedandina xwendinê yekser kar bikî yan xwendina xwe li xwendingeha bilind ya pişeyî berdewam bikî. Tu dikarî jî ji xwe re kursên zêde bixwîni da xwendina xwe li xwendingeha bilind bidomîni.

## PÊNC PISPORIYÊN CUDA

### Wasîteyên saziyan

- Tu dê zanyariyan li ser trafik û karên erdê yên di warê karên rê û şebekeyên gehandinê de werbigiri. Ev pisporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, şoferê wasîteya saziyan kar bikî.

### Xaniavakirin

- Tu dê zanyariyan li ser avakirin û tamîrkirina avahî, pir û saziyên din werbigiri. Ev pisporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, betonkar, zemîndaner, hostayê dîwaran, camcî, îskelesaz yan xeratê/necarê avahiyan kar bikî.

### Erd û sazi

- Tu dê zanyariyan li ser karên erdê yên ji bo rê, rêyên hesinî û fayansdanîn/kaşidanîn û kevîrraxistin û hwd. werbigiri. Ev pisporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, karkerê rê û saziyan yan teknîsiyênê rêya hesinî kar bikî.

### Boyaxkarî

- Tu dê zanyariyên li ser nûboyaxkirin û jinûveboyaxkirin û bicihkirina rûpoşên dîwaran û rengan yên cuda werbigiri. Ev pisporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, boyaxkerê avahiyan kar bikî.

### Safkarî/Sefarî

- Tu dê zanyariyan li ser safkariya di warê avakirin, ventilasyon û hawayê hundirîn werbigiri. Ev pisporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, safkarê avahiyan yan safkarê ventilasyonê kar bikî.

## Tiştên ku tu dê di vê bernameyê de fêr bibî

Tu dê zanyariyan li ser avakirin û sazkirinê werbigiri. Tu dê zanyariyan li ser ka mirov çawa bi fikirîkirin, bi ewlehî û bi jîngehparêzî karê avakirinê dike werbigiri. Tu dê zanyariyan li ser kar û prosesên karî yên cuda yên vê branşê werbigiri.

Bona mirov xwe ji zianên karî biparêze û tenduristiyeka baş pêk bîne, giringiyeka mezin di vê bernameyê de li ser pirsên jîngeha karî ye.

### **Bername weha hatiye rêxistin**

Madeyên dersê di bernameyên pîşeyî de madeyên lîseyê yê hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê. Di bernameyên pîşeyî de, tu dê zêdetir madeyên pîşeyî, yê ku jê re madeyên taybetmend tê gotin, û kêmtir madeyên ku te li dibistana bingehî xwendine bixwînî. Avahî û sazî madeya taybetmend ya hevbeş ya vê bernameyê ye.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bername-kûrkolîn (programfördjupning). Ji xwendingehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendingehê bipirse ka kîjan kurs hene.

### **Awayên xebatê**

Bername li ser pirsên ku tu dê bi serê xwe yan bi yê din re çare bikî ava dibe. Tu dê şiyana xwe ya înisyatîf-girtinê û behremendbûnê xurt bikî, û zanyariyên zêdetir li ser îmkanên birêvebirina şirketeka şexsî werbigirî. Tu dê hîn bibî ku bi metodên serdemê plankirin, pêkanîn, dokumentkirin û kalîteparastin ya karî bikî. Tu dê fêrî bijartina techîzatan, metodan û awayê karkirina ewle bibî.

### **Projeya lîseyê**

Tu dê di dawiya Bernameya avahî û saziyê de projeyeka lîseyê di warê pîşeyî yê ku te bijartiye de amade bikî. Tu dê bi wê nîşan bidî ku zanyariyên pêdvî yê ji bo destpêkirina karê ku te ji bo xatirê wî xwendiyê li bal te hene.

### **Fêrbûna li cihê karî**

Hin beşên xwendinê herî kêmtir 15 hefteyan li cihê yan çend cihên karî bi rê ve diçin û jê re arbetsplatsförlagd lärande (apl) – fêrbûna li cihê karî – tê gotin. Ev parçeyeka giring ya perwerdeyê ye. Apl tecrîbeyan û herweha kontaktan yê ku dikarin di dema lêgerîna karî de ji te re bisûd bin dide te.

### **Şagirdîkirin**

Heger xwendingeh di çarçoveya bernameyê de perwerdeya şagirdîkirinê ya lîseyî pêşkêş bike, tu dikarî wê hilbijêrî. Maneya wê ew e ku tu dê heman zanyariyan werbigirî lê dê herî kêmtir nîva xwendina xwe li cihê yan çend cihên karî bikî.

### **Balkişandin**

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên bingehî yê xwendina bilind bi dest bixî. Ji bo bidestxistina şertên bingehî yê xwendina bilind tu dikarî li gor dilê xwe di çarçoveya hilbijartina ferdî û bername-kûrkolînê de, heger xwendingeh wê pêşkêş bike, kursên pêdvî bixwînî. Ew du kursên zêdetir yê zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê û kurseka zimanê îngilîzî ne. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pîşeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.